EHMED HUSEYNÎ

# BI XEWNA WE PÊNÛSÊ DILORÎNIM



# Bi xewna we
# pênûsê dilorînim

# Bİ XEWNA WE PÊNÛSÊ DİLORÎNİM

Helbest
1984-1992

Weşanxana JÎNA NÛ
*Uppsala*
1993

Diyarî

...bo Ebdulbasit û hemî xortên ku axa sar ya goristana Amûdê ji xewnên wan re bûye aramgeh.

...bo Ebdulwehab, hê jî ez nizanim tu bav î an bira yî?

Ehmed Huseynî: Bi xewna we pênûsê dilorînim
*Weşanxana Jîna Nû, Box 30, 740 22 Bälinge-Sweden*
© EHMED HUSEYNÎ 1993
WÊNE: REHÎMO
ÇAPA YEKEM, 1993
MÎZANPAJ: ARIF ZÊREVAN
ÇAPXANE: APEC, STOCKHOLM 1993
ISBN: 9188054-187

Pirtûka Ehmed Huseynî ya berê derketî:
*Mistek ji şîna bêcir 1990,* (Ligel M Efîf Huseynî)

NAVEROK

1

PIRTÛKA KEWÊ BÊZAR ........ 12

Bûka Agir ........ 14

Zerdeştê Biharê ........ 27

Şino Can! ........ 34

ÇARÇIRA ........ 47

Yekçira ........ 48

Duçira ........ 56

Sêçira ........ 59

Çarçira ........ 62

Newroz û serbitackirina qublenameya giyan! ........ 68

1- Xwelibakirina Agir ........ 69

2- Şahnaziya Avê ........ 71

3- Bûyer û Rûpelên Axê ........ 73

2

AWAZÊN RONO ........ 76

RONO 1 ........ 79

RONO 2 ........ 80

RONO 3 ........ 81

RONO 4 ........ 82

Ronahî ........ 83

Tilî ........ 94

3

NAV Û DABEŞKIRINA XEWNÊN HÎROYÊ ........ 103

DAYÎK ........ 106

SEÎD RÊZANÎ ........ 107

AMÛDÊ ........ 108

MENAL ........ 109

SÎPANO ........ 110

TAHA XELÎL ........ 111

FERAT ........ 112

GIRÊ ŞERMOLA ........ 114

DÛRÎ ........ 115

PIRS ........ 116

DÎLAN ........ 117

Bo Remzî (S. Rêving) ........ 118



Derdî dûrî.. Derdî dûrî kuştimî
Derdî wişyarî û sebûrî kuştimî
Yadî yaran û welatim roj û şew
Lê heram kirdim qerar û xurd û xew
Xem rewênêk lêre min nakem bedî
Çon pena bo mey nebim, saqî! Edî!!
Nabînim xak û welat û şarî xom
Nabînim nasya û dost û yarî xom
Rû le her laye dekem, namo ye bom
Nabînim cê jwan û kewne lanî xom
Şew dekêşim, şew nexûnî û bê xewî
Roj deçêjim derd û daxî bê ewî

Hêmin Mukiryanî

Kesê mihnet dî û firqet vexwarî cir'eya hicrê
Girî wan tê bi halê min, di vê hicran û zecrê da
Bi dama muhbetê bend im, xedenga firqetê dil nuht
Bi şubhî murxî nîm besmel di hev wer têm di xwînê da

Melayê Cizîrî

# DÎLOKEK BI NIYAZA PÊŞGOTINÊ

Yara min... Babelîskeke xwîngerm - sergerdan ji rewrewka wê çolistanê dipijiqe, li ber dergehên rizyayî yên dilê min, toza xwe pêşkêşî termê bêrîkirinê dike... şeveke reş a tarî giyanê min bi bîna hinê, bi tîna gulbeybûn û hezhezûkan, mist dide. Ta ku ez û pencereya çavbirçî, gulên ku ji çilmisandinê çeng dibin, û baskên mirinê di hêlîna nalînê de fêrî firînê bibin.

Erê yarê... va me, di perestgeha şîniya dijwar de me, di nav destên xwedakî zorbaz de, wek mirîdekî gunehkar dilerizim. Li beramber çirên qonaxê, bi destê westana xwe digrim û bi hustûxwarî sucde dibim. Firtonan û şevbuhêrkên bi tore di bîbikên xwe de kedî dikim, bê berpal û bê fener, di zixtên mirina hovane de, aferîdeyekî bêzar û xewnşikestî me.

Ez dê ji kîjan alî ve xwe bi ser çemê nalîna we de noq kim?

Ez dê li bin kîjan esmanî axeke sar bo xwe hilbijêrim, ta ku laşê min bi kurmikên taristanê û'bi bêdengiyê şa bibe?

Ez diramiyam
çawa jiyan derbas dibe
çawa bi bêdengiyek mezin mirin têt
...jiyanên me rûbar in
xwe tevî deryayê dikin
derya jî mirin e
Khorkhe Manrik (1440-1478)

Ez dê kîjan heyvê li ser darbesta xwe binimînim, di sînga oxirê de daçikînim ta ku ferişteyên girî mist bi mist, di gurrîna pêlan de, bişkoj bi bişkoj di daristana nalînê de, doj bi doj di raperîna lêvtîna bengînê de bixeniqin?

Xemgîn im yarê, bazinê vê êvarê di hûçikên dîlokên te de, asê maye. Ne zaroktî û nê jî hespên dudil dikarin hetava van sirûdan bigihînin herikîna rûbarê demê. Ne rengxwelî nêzî harmoniya qebqebê dibe û ne jî kewên reşbêniyê xwe dispêrin seretayiya firînê. Te di bin zimanê xwe de dimeyînim/te di agirdanka parsûyên xwe de dikelînim/te di kalana kêlîkan de, di landika pinpinîkan de, di volqana perîkan de dilorînim/ kezîmarên te bi berbejn û pazbendan, bi xoş-xwanên rêving û revendan, bi îstgeh û bendergeh û çadirgeh û xwînreh û bi kormehan dixemilînim.

*"Hemû rengên kevnar di dilê min de xwedî ronahiyek xemgîn in. Ma gelo di xuristê de jî wisan in, yan çavê min nexweş in."*
Van Gogh

RONO:

Li ser bergeha wê oqyanûsa tozînî, rengên qedera me ji guhanê babelîskan dihate dotin. Her ku ferhenga rengan di pêxêra Girê Şermolan de diçelqiya, rengê qehweyî, dilop dilop, ji qilçix û belgan, ji pîvong û stirîzerkan, ji bîntengiya keroşk û qitikan, dinuqutî...

Rengê qehweyî ye, rengê zaroktiya me yî qurmiçî ye. Li wê çolistana tozperest, eger axîn û ax ji dayik bûn, eger şevçirax ji memikên êşê qut bûn, wê mirî bêrîkirina zindiyan bi cî bikin. Lê jîndar wê çawa qehweyîya çavê miriyan ji bîr bikin???

Ehmed Huseynî

# 1
# Pirtûka kewê bêzar



Ez ji wan xelka me, yên ku di êşê de distirên
Ramboud

# Bûka Agir

Eger hat û çiyan bi dilovanî destên berbangê ji pêçeka kevirînî ya evînê deranîn...

Kelagirî di dilê Hekarê de geştir dibe, li ser pelên axîna wê î tûj - ji bêçarî - kew û dîlan hev dinasin.

Berbanga te,
di banga riziyayî de,
mat mayî
dilop dilop
baz dide ji seyrana şûr
kulîlkên bi demûşa şebnemê
yên bi nûçeyên dawa serdemê, har bûbûn
li pê te
li pê xizêma dilê te
gihiştin
xwe dahiştin pêla rewrewka dûr
vê taristana kûr.
Mêvanên te ne potîn û xewnên stûr
bagera tozê, romî û kûrekûr
serbazên çavsor, psîkopat
rimbazên bêcir î bigincir,
mirin,
mirina ku tiqiyaye cûr bi cûr
tiliyên te ji nifiran derdibin
şîşên birînan di lerza te de,
kerr dibin
û sibehên te şermîn in,
koçên xwe di mij û talanê de bar dikin

êvarên şîrkî di herikîna gezo de:
şûnşopan û çizeçiza dilan
hêlînên hêwî yên qulingan
sersariya rêvingan
reşgirêdana gulan
di ava maçê de, nas dikin
helbestên barana tirsokî
sazbendekî bêhiş,
tembûreke kod bixwîn
bext dane te,
rext dane te,
next dane te,
gulvedana termê te, sipas dikin.
De rabe Hekarê!!
Li te gunehkarê
şevbuhêrka te,
dîroka te nû ye...
şîniya te,
gava payîzê zû ye...
tu ar î,
tu neviya dû ye...
bûka ji gîhasêvkê
bê lîlandin û berbû ye...

Şevger,
payîza pirçzer, digindirin
zarokên bi şîrvekirî,
çavşînkên şimakirî,
digindirin
zimanê jêkirî
xwîna xwe dimije, digindire
xwe çem dike
devê berbanga gemkirî
salên ji berû û mewîjan, çûn
winda bûn.

Bi hetava giyan re zîvirîn
û gindirîn
xewn ji hev ditirsin
hêsrên hinarkên zer diçikin,
zarok navên xwe, rojçêbûnên xwe
diçirînin
ne dilşad û ne dilşîn in
şagirtên serdema ceger bixwîn in,
lepên gundiyan bi lez
movikên xwe hiltînin
tarî bi gazin e ji tarîtiya xwe
tû dike rengê xwe,
dergeh tên girtin
bahozên zer poşman dibin
rûbarên sor ji keskesorê
bêguman dibin
zemîn têt xemilandin

seranserî Hekarê têt çirisandin:
bi maçên zuha
bi lêvên qelişî
bi sîngên sîngokirî
bi pêsîrên tazîkirî
bi Hekarê,... nîvsax
nîvsaxî mirî.

Hekarê?!!
De rabe ser xwe!
Rabe, zengil bide dest xwe
hemû rexên payîzê ji hawara te re
hatine afirandin
kolan bi kolan dilbijokên te ne
hemû gornepaşên tovên gwîzê
gor bi gor dilbijokên vedana te ne
dayîkên xwas
li ser bênderan
berzûrî pêxemberan dibin
sorgul guh nadin mûzîka baranê
Yezdanê pak û dilzarokî
Xwedanê not û neh navên fediyokî
ketiye serê dîlanê
Hekarê...
têkeve destên wî,
pêlekê ji xwêdana xwe bidiyê
lê xwe mediyê lê
lê lê bi qurbanê.

Payîz e Hekarê
de rabe gulokê
vexwe, wekû şûrekî di ber xwe xe
nalîna ti'okê
rabe ta ku em bi ava bîhokan destnimêj bigrin
ma ne:
rojhilat di xeftanê te de asê bûye!!
Rojava di çepkên te de çêbûye!!
Bakur ketiye paş çeperên şevê!!
Başûr bûye leheng û hozanê revê!!
De rabe bo min bêje:
kîjan darê ji dilê xwe re bikme kerker
kîjan darbestê
ji govenda birçiyan re bikime per
kîjan çiyayî ji hejmartina qamçiyan re
bikme ferheng
kîjan zemînê ji sirûda serbixwebûnê re
bikme pêşeng
kîjan helbestê ji naskirina hebûnê re

bikme sînor
kîjan mebestê ji gewriya nebûnê re
bikme tor...?
Rabe bo min bêje:
kîjan stiranê di bin çermê xwe de veşêrim
bo piyala serxweşiyê
kîjan lavlavê hilgirim
bi dû termê xwe de
bo şemala rûreşiyê...?
Kîjan peyvê ji te re bikme balgeh?
Kîjan xencerê ji pêşenîka te re bikime şeh?
Kîjan QENDÎLÊ ji cergê te re bikime reh?
Amade be Hekar!
Ez û tu bi tenha xwe ne
bo te şîn, bejna qirkirinê
û çavên Zîn..
bo min kîn
bîna bendewariyê
kêferata HEMRÎN

Hekarê!!
Îro... min tu ji serhişkiya çiyan hilbijartiyî
îro ... min tu di albuma giyan de veşartiyî
îro tu jîn î,
dilrevîn î
bi vizeviza gullan jimartî yî
di riwê min de girtine, guliyên berfê
li ber çavên te yên hingivînî
sêdar kirine banga defê
ta ku /HEKO/ ne dawiya qîrînê be
                ne mizgînxêra evînê be
                ne goşiya çinînê be
                ne xewna ax be
                ne bûka taxê be
tên, ji çar alî, demsal û payîzên qerfê.

Bêdengiya te payîz e
mirin bi ser te de ket
gulwaz ji ferhenga te diherikin,
bê minet

diltengbûna te
li gullebaranê rast tê
dilê me bi ser te de dikeve/
welat dibişkive
di guharê berbangê de dilive/
tevzînok,
pîrhevok, te bi nav dikin
Dilop
D
i
l
o
p
Canê te li me belav dikin
H
E
K
A
R
Ê

H
Hawar e. Zixtên serxweş dihingivin gurçika rojhilat
Hişê hîman bi qolincan têt guvaştin
Dilsojiya pinpinîkan, hej û xwelibakirina gulan,
goristanên bîrtûj, bi tîpên reş î geş dinivîsînin:
xelat, xelat
husa hatiye serê kewan, romana bênav e
wişeya bêzirav e,
navnîşana felat e...felat.

E
Esmanê gerdenşîn e,
ewrekî sergerdan û dîn e,
dêmên teze û berberoka terikî xwe newq dikin
banga gulfiroşan ji xilmaşbûnê radikin
sînga germ bi aleke pîrozî şa dikin.

K
Kevok li hev dicivin
xwe dişon bi keskesora çiyan
xwe dadiweşînin ji ariya topan
xwe diçivînin
xwe digihînin hêlîna kilkirî û şaxên nîştiman.

A

Azadiyeke sor
bi poşên xwe perda bindestiyê diçirîne
bi quloçên xwe navê zîndanan
li ser eniya rokê dikole.

R

Ronî, nimebaran, rêçên tazî,
dastanên bargiran, çûkên şilbûyî, cejnên kûrdûnde,
bazên ku di xebxeba çiyan de dilebitin
ji pencên berbatê difilitin:
Kurd ?!!
Kurdistan an Kurdistiran
gêrikên bê moristan
tiriyê merzone û
lêva sedsaliya bîstan.

Ê

Êş, keziyên hevrêşimîn dipêçin bîranînên şêlû û serserî,
di xewnê de dibin bîn-bîhok
çivîk û zarok te himbêz dikin:
B û k a   A g i r e
N a z i k e
L ê v t e n i k e
Payîzxêr e, girnijîneke bi guregur e.

Hekar!!
Wê gund û şar
sazbend û gulbuhar bimrin
berberojên ku stûyên xwe bi dû rokê de xwar kirine,
dê bimrin
lê,
dê şilî têkeve şûna zuhayîyê
dê banga te aza bibe ji pencên bayê
dê şalê te raweste li ber pêlên tayê
çûk, pepûk, taristan û neynûk
dê biweşin ji duriyana axîna dayê

Payîza 1984-an.

# Zerdeştê Biharê

Bo Zekiye Alkan



Şev şîna şîn dike...
Hedan hêviyê hîn dike...
Bahoz buharê bîn dike...

## 1

Şeva bê kelek,
Tu,
Pêlek ji Birca Belek,
Û
Pitepita bayê felek.

## 2

Gulên çavhar
di porê te de, derizîn.
Movikên çaxê,
poşmaniya qonaxê,
nexşeyên deyaxê,
di seqema xewnê de, lerizîn..
Tu,
biyaniya şor,
azadiya zuha,
bazdana reha,
Û
bitavekirina meha,
ji fîkefîka xwînê, dipengizîn.
Çavên bêkevok
bêgezo û bîhok.
Agirê pîr..
Agirê ku ji qudûm dikeve..
Agirê ku di cejnê de,
di pêçeka her du lêvên te de,
radikeve..

## 3

Girî li ser dara sibehê,
rojhilat û toza gunehê,
çiyayên geş, mîna şîniyê,
çirên vemirî, mîna xweşiyê..
Tu..,
bayê ber tavê
bajarên ku xwe li ba dikin,
sînorên ku goristanan li hev par dikin,
stêr ku xwe bi ser bişirîna te de xwar dikin.
Tu û buhar,
guregurê di hêlîna evînê de şiyar dikin..

## 4

Welat ku hat
tîpên xwe di êgir de ji bîr kirin
Dastan bi baskên Firat zencîr kirin
Welat ku hat
ewrên buharê kirin hêsir
çiya ji xewnê re kirin pêsir
Welat ku hat
birûsk ji kalanê avêt
şîrava koç û konan mêt
Welat ku hat
dereng di jînê de riziya
dereng şîna sahî za
Û tu...,
Û welat... qebqeba kewan dinoşe
Û welat... li ser kêlan gula reş e
Û welat... alên sor didirû
Û welat... wê sibehê te dabû dû
Û welat... pişkoka tirsê hildikir
Û welat... sonda te bi agir kil dikir
Û welat... kela berfê himbêz dike
Û welat... şehîdan di tava rokê de rêz dike
Û tu...,
Li morîkên welêt kerr û gêj bû..
Û welat di reşika çavên Diyarbekirê de, Gelawêj bû..
Te berê xwe dayê,
Pinpinîk e, bi hêsrên Kurdistanê bi destnimêj bû..

Şino Can!

Şino can!! Dilê min ê stewiyayî bi xencerên bêdengiya
te. Hemû pêlên xav ên xwîna sor î matmayî
xwe çem dikin hinarkên şeva goristanê,
û şev şêt û sermest e!
Li ber serê te bişkojên giyan dibişkivin,
axa pîrozwer direqise
çavên me dişkin û stêrkên penaberan ji dilşadiyê
dinalin, hemû kulîlkên talanbûyî bîna xwe bi ser
zelûliya gorê de diguvêşin...
tu çûyî.. te kilîtên zêrînî yên daristanan, yên
şkeft û qûntaran, bi xwe re biribûn
bêtaldeh û dîwar, te em li ber barana reş, mîna
çûkên baskokirî hiştine
me dîrokek ji qralkan, ji te re dikir palpişt û
me serê xwe, me her derê hinara xwe datanî ser
gerdena gorê,
ya ku ji tîna rokên koçbar, xelmaşbûn bi mijankên
QENDÎL himbêz kiribû...

Hespê te parastina me ji bahozên bêrûmet nedikir
rim di goştê me de li ba dibûn
gumegum di kezeba me de ditevizî
simên biyaniyan di bîbikên xewnê de radiçikiyan
me bar dikir û qantirên bînçikiyayî berya me
diwestiyan, bi çavine girikî li me temaşe dikirin,
û hêdî hêdî digiriyan..

Lê ji bilî gunehkariyê, ji çermê me nafire
lê ji bilî tawisekî, di hêlîna can de nîne
ji bilî dewr û dewranên quling û nêrkewan di esmanê
hişê me de nînin.
Ji bilî sirûda qayikên bê deryavan di derya xwîna
me de nîne..

Karwanê dil-bîhokî, hîva ro-zarokî
qumrî û pezkovî di êtûna berfê de, dilerizîn..
vaja baranê, zixt û halana dîlanê
saz û pinpinîkên kovanê bi dumanê digevizîn..
biskên şevînî, lêv û miska dilrevînî,
çirên buhara nîvco, gerdenîka Şino û co, dipengizîn..

Û Şino can bi hemû babetan dijîn, ta ku tovên
hebûna te bi tavên evînê av bidin. Bi hemû xoş-xwan
û lawik û dîlokan dimrin ta ku rexên
nebûna te bi tîrêjên berbangê, bi xuşexuşa çemê
azadiyê avis bikin.. Tu bi tenha xwe bûyî û
di ferhenga te de demsalên girî zuha dibûn.
Penaber in, koçer in, mişext û derbeder in, biyanî ne,
bêgane ne, xerîb in..,
ax Şino can ev peyvên oxira reş çi li bejn û
bala çiyan in, bejna zirav î ji bîna zeyzefûnên
kevnar, bejna şermokî ya ku xwe li nik kêlên gorê
bi bîranînên nexşeke dijwar pêçaye..

Me bar dikir... Xwedan stûxwar dibû
me bar dikir... Aras xembar dibû
me bar dikir... gerdûn gemar dibû
me bar dikir... jiyan tamsar dibû

Û Şino can bi lez berê xwe dida şevbuhêrkên şahînşahiya berûyan, komara başokan û perestgeha hechecîkan.
Were bi navê çiyan û dilovaniya xezalan, were tu û Ferat li serdema mêrkujan temaşe kin, biyanî ne ji dû pişta xewna me venagerin,
her ku dibe buhar ji bîna şilêran bînteng dibin,
bi seyrangeh û zozanan madtirş dibin,
cîqên havînî ne,
sînga wan û bayê Zozik li hev nakin. Bayê te mîna marmasîkî
di gewriya wan de dimîne,
xewna te kenê wan dorpêç dike
û mîna bav û kalên xwe,
lê vê carê ne bi hesp û şûr û mertalan,
lê bi gulle û tank û topan Şino can, bi gaz û jehr
bi balafir û serbazan Şino can, bi potînên stûr, bi singo û bombe
û bi zikreşiya zemanan Şino can..

Mahabadê! Gêrikên rengo-rengo bi demûşa giyanê te ketine
Mahabadê! Hespên boz î birîndar serî ji bayê ber tavê stendine
Mahabadê! Koçer in, di konên bêstûn de, di şopa derdê te de raketine
Mahabadê! Û ken ji nû ve bi adarokan re nifir e,
pêjneke çetin e.

Sar e û zaroka min heft mehî bû.
''Gulvedan'' a min keser vedida û bi çavekî ziq î bêbizav
li rêzên
mij û çiyan dinêrî,
her ku şûjinên dîrokê lerzek didan canê wê, vedicifilî
li pêçek û çavşînka xwe dipirsî.
Min Gulvedan bi ahengên seqemê dilorand
wê jî behişta zarokan di hêlana sedsaliya bîstan de,
ditepand.
Û şîr di çiçikên êvarê de dimiçiqî, penêr û jajî
di qurçikên buharê de diperçiqîn,
sorgul di lêvên Gulvedan de zuha dibûn,
kezeb e...! şêrîn e Şino can!
Û va ye, çûka behiştê ye, bi baskên nermînî xwe dihungivîne
bêdengiya gorê,
perda şîniyê bi çîveçîva giyanê xwe ji ser rûyê dîroka
segbav
dide alî,
tu destê xwe dirêj dikî û Gulvedana min î heft mehî
di germahiya birîna te de xewa dawîn hildibijêre.

Û bi tenha ye Sebrê!
dînê te di werzên şîna xweş de serxweş e
Di vîzevîza keldumana koçbariya te de morîkên reş e
guharên şeva bêguh
çemên hinarkên te, peşkên kila te î şor, ji ber dike
bi tenha ye Sebrê
çend kew di xurçukê de
çend simbilên hesretê di quncikê de
xewnan ji bîra dilê te dikişîne
şalûrên kenê te
fincaneke qehwe ji ava Xabûr
û teşîrêsekê ji pêxêra bahoza te radikişîne
goşiyên kenê te/ Tirş e kenê te, goşiyên sor
xwîna nûrijiyayî li ser eniya sînor/
kanîn elbikên mewîjên te/ canbazên li hawîrdor/
gullebaran e Sebrê!
Gulle, gulle har dibe kula te.
Tamsar dibe firmiska ji kila te

Û hawara te tûj e, qeymaxê şeva kor dişkîne
Gava te ya sist û bêarmanc di goştê demê de hiltîne
Mayin in di bin gîha de ne
Mayin in di tevna riya de ne
Mayin in di rojname û mehan de ne
şarên Mûsilî ne, şohiyên kesrewanî ne
kiras û xeftanên gulgulî ne,
di kinişta şevê de
di mala Xwedê de birçî ne
................................
................................
Kî dê çiyan di dîloka mirinê de bilorîne!!?
Şino can û şevên penaberan bêxew zîz dibin
li w'alî pencerê,
şevreş û pêlên xwînê bi hev re dastana seqemê, hawara berd û hîman dadimezirînin.

Û li w'alî pencerê, rengekî qetranî ji spîbûna oda min diherike
bi ser wêneyên dîwêr de dipêle, hemû bîranîn bi hev re diteqin.
Dilê min î ji qirkirinê, ji ferhenga şehîdan
xwe ji gerzela bêrîkirinê çem dike, xwe radipelîne, digindire
bi ser nêrînên te de, bi ser dengekî xemgîn de, dengekî
ku dirust bûye ta ku bikaribe damarên şevê di ser dev re bibe
bi termê rokê.
Dirust bûye ta ku bikaribe dil bi şîniyên giranbuha binermijîne.
Û dîwarên odê Şino can diqirçin, ''Kanîspî'' diponije û roj
ji maça ''Helec'' hiltê,

û gora bêdeng di pênûsê de radipere, ''Bavê Felek'' û dilê Kurdekî bêwar bi hev re diqîrin, şadî mîna xiltê kwîr di taristana navdar de winda dibe... Ne helbest bi kêr tên û ne lojîka jînê
ne şev diweste û ne jî karwanê, kînê
ne gul vedibin û ne jî peya dibe siwarê evînê:
Lê lê lê Sebrê!
Mi go wextê malê me bar kirin ji belê
Lîbelê lo...
Lê mi go qasidê xelk û 'alemê tev
diçin û têno...
Qasidê min û bejna zirav, dêmên dugulî
gulokê berfê, tavê baranê tev de têno...
Ay lê lê Sebrê... Lê lê berxê... Bavo hey bavo.

Wek êşekê, bask bi pêş de diçin
Wek êşekê, Kurd bi alî rastiyê de, bi pêş de diçin
Wek êşekê, berbang cîwaran, koçbarî koçbarî,
ji keçên xwe re dibêje
Wek êşekê, roj, kor derbas dibe Mahabadê.

**Selîm Berekat**

# Çarçira

# YEKÇIRA

## 1

Çiqasî tî bûn çiyayên te?
Rewrewka hesinî ji xewnên Dimdim bû
çiqasî di derya jînê de karwanên te
perwanên te mirina şevçiraxan dîbûn?
Av bi zimanê ''Pîremerdûn'' diket
evîna me, gulçîna me, govenda gulan,
ji buhara şûr û riman dadiket,
qevdek ji roka şkestî
mistek feryad û serbestî
ji gulistana birînê derdiket,
li nik mij û keldumana ziyanê
zuha, bêbaran û bi tenha radiket.

## 2

Xewna te li kû ye Xwedayo..?
Û keskesora yanzde rengî
di esmanê şevê de dilikume
te em bi şîrê şêran xapandin
te em di gerdenîka komarê de civandin
û AHOREMEZDA di bayê sibê de
di lerza mûmê de livandin
û guhanê SABLAX va ye
bi tiliyên te dinixume..
ma te ha ji neviyên xwe heye..?
Hişê me di sînorê gernamê de kerr bûye
êvara ku şilêr tê de kuştin
va ye di birîna guldankê de werbûye
teyrê berate ro li nîvro
fêrî goştê me bûye
û tu jî bi ser de çûyî û kenê sorgulê jî bi te re çûye.

## 3

Ewrên bêrîkirinê
xwe ji sê hawîr li te digirtin
dergehên dîroka ji xweliyê
bi dû Mezopotamya de digirtin..
Komara ji xunavê,
ji werzan û tavê,
ji bejna sûlavê,
ji destên te ên yasemînî radigirtin..
û me newqa çiya,
baskên giya,
dagirtin bi mêran û egidan
daristineke tirs
ristikek pirs
te da ber xumexuma şehîdan,
û zinarên zirz î miz

mişt dibûn bi pezkoviyên aramê
serdema şît î xiniz
dijminên çavsor î diz
bûbûn kevan
pelû dibûn mîna guran
qirêj dikirin pîrozbahiya germamê..
û dilşadiya şîrgermî
bîranînên sedcar..
Yekçira xembar
çarçirên kevnar
Dafên te bapîr û lavlavên te
her çar şîlanên jîndar..
bi ser kêferata me de piç bi piç
mirin bi mirin daketin xwar.

## 4

Û Qazî!!
Tarîbûn di hilma şevê de
tîrtir bûbû giyanê te
ê ji çavlirêmana gîhan
di serhişkiya bayê kur de
şîntir bûbû
xencera te ya ji Xelat û Sîpan
di azadiya ber tavê de
zingarîtir bûbû
qada merd.. rivîna bada te ya bi derd
gezoya talanê
di bêrîkên gwîzê de
sersarîtir bûbû
zimanê te yê ji lalan
ji destpêka jena nîştiman
di devê berfa sor de tîtir bûbû.

# 5

Wê gavê
me rexên sirûdê bi nermîn kolan
lê bêbext bû hişê "şehrezad"
me xaçerêkên xewna te
bi tûj-rengên balgeha Zîn kolan;
lê bêbext e evîn ku ji ferhenga Xanî be
Mîtra li me vedigeriya, disincirî
Baba Tahir xwe radipêça bi helbestên kelogirî.

## 6

Wê gavê Kawa di çarçira de vêdiket..
Anahîta diçirisî li ser hina xwîna te
dilê te ji ne'ne'ê kesktir bû
hawara benefşan
raperîna zirne û deholan
çi li bejna agir bûn
hêlînên kevokan
ji cubbê te dipekiyan
cendekê Gelawêj
Zendavista û dengbêjên bênimêj
li dilovaniya Laleş vedigeriyan.
Û Qazî!!
Koremarekî ji milên Zehak
di hubra Şerefxan de radiçikiya.

## 7

Wê gavê
me bi hêsrên xwe bang dikir:
Yekçira ye
û kerkerên mewîjînî,
hê penaberan ji keserên Mahabadê
nepîvane...
Yekçira ye
û goristanên bêkêl
hê di hinarkên berbangê de
ne xuya ne...

## DUÇIRA

Zistana xemgîn, du çirên zêrîn û kulîlkên Komarê ji tenûra bendemanê derdixistin..Bi gullebarana bêol û dîn Kuliyên wê, guliyên wê, weliyên wê diristin.. Kîn e, talan e, xwîna kewan e, bi ser guliyên berfê de dadixistin.

*Eger*
*te bi qurtek av*
*ji Deryaçey Mahabad*
*tîna xwe şikand...*
*Eger te ji bêçarî*
*dengê xwe di dîrokê de*
*çand...*
*Eger te devê xwe*
*ji lepên şebnemê berda...*
*Eger tu bûyî nûner,*
*siwarê mehîna derda*
*Eger*
*te kuç û kolanên sor*
*derbas kirin...*
*Eger teşîrêsan*
*teşiyên*
*xwe yên ji xwînê*
*di hişê te de rakirin...*
*tu yê bizanibî*
*ku tu gihiştî sêdar*
*û canê Kurdan...*

Û çirîskên qaşa gustîlka te,
sirra miskê dipêliya li ser
kenarên wicdanê te
û karbanên tizbiya felekê
ku yekoyeko li ser darbesta
Komarê radixistin
û hatin
zikreşiya wan di çavê wan de
rimbaz û serbaz di gava wan de
derbas bûn zîzbûna şevê..
derbas bûn navika sêvê..
derbas bûn hêlîna çûkan..
derbas bûn bişirîna bûkan..
em di oxira tûj de daleqandin
mayinên şîniyê di me de teqandin
wê gavê..
her du çirên westiyayî
pîjên roka çiriyayî
û xweliya ji ber renga mayî
ji goristanên me derdihatin
Em bi dû şopa te ketin
sînorên te ji çermê me diketin
ta ku em di Sîbîrya re derketin
sal bûrîn
di seqem û xwelîdankan de digevizîn
li ser balgehên bêrîkirinê dilerizîn
wê gavê
perwana te bi agirê dilê me haş bûbû
pêdariya tûyên Şino

bindestiya berûyên Balanbo
û rastiya baranê şaş bûbû
lê hê em zarokên te ne..
serê me ji lêvên çiya nermtir e!!
Dijmin bûye dost, rih nebûye bost!!
Û kew...hew dibe dijminê serê xwe!!
''Merqeda'' te li kû ye Qazî
Ta ku em bidinê berê xwe !!?
Ta ku kûrekûra Ûrmiye bimiçiqe...
ta ku Zê bi xeml û xêz
ji kenê hîman bipijike
ta ku zirta me jî
di nav tiliyên te de bixeniqe.
Em neviyên te ne
kenar in ji bo bihurîna navê te
mişext û bêwar in
hildiperikin dawa te
komarxwazên şîn in
sermest û dîn in
diniqutin ji sawa te.

*Li nik*
*tirsa xizêmzîvê..*
*li cem*
*raperîna siya behîvê*
*li ba bêdengiya*
*çemê axînê*
*li gel*
*arama*
*şaxên birînê*
*bi dîwarê zindanê re*
*bi ferhenga kovanê*
*li nik dîlanê*
*çîrokên talanê*
*mirina baranê*
*fêr dibû*
*têr dibû*
*ji hezkirina jiyanê!*

SÊÇIRA

Mem û Zîn

Tiliyên we yên bê xelekên nîşaniyê
bi ser ava Botan de diweşiyan..
dîwarên Birca Belek dilên bêkelek
li gel tac û gulwaza Komarê dimeşiyan..
pelên gulbuhar û lalan
winda dibin bi cobaran
birûsk, payîz, hevdîn, rojên bitîn
bi ahengên we re dinalîn û diêşiyan
şev e Zînê
tevlîhev im
dûrî te me
ji xwe direvim
were dînê carekê binoş
vê şêniyê
ji min bidoş
çavên te bûn bo dîlokan
bo rojhilat û pîrhevokan
çirên te bûn.. ewrên rûreş
ji gavên te bûn
ronahî bû
bendemana spehî bû
Mem
û axîn, ji şevreşê dikêşiyan..

## Ferhad û Şêrîn

Destên we di penceran de xilmaş dibûn
qulingên westiyayî,
asoya bê ba mayî
roka ku bi pêlên kesk diçû ava
diyarî we dikirin..
koçer û kerî li we dizivirîn
xaniyên ji kilsa demê
şar û bangên li paş gemê
xwelibakirina nîştiman
lîlan û razan
di kezeba bendemana we de radibûn
û di derya eşqa pîroz de
kef û şîniya şîn hişîn dibûn
lê şêrînê
lê bîhokê
fermo dilê vê kevokê
çirên te bûn
diçirisîn li ser xwîna wan sorgulan
kewên te bûn
xwe dispartin kurtepista wan kavilan
rêwî hatin lê şêrînê
konvegirtin li dor birînê
bi tenha ye
gir ji xewna ye
tu dilşad î!!?
Tu bînçikandina Ferhad î.
Bi lapûşkên wê zemînê..

## Siyamend û Xecê

Sîpanê Xelatê
Di ser dev re çûye
bi pirsan, û muzîk û seyranê
qonaxa bê tevzînok di xwêdana
gavên Demilqiran de, winda bûye
pezkovî ne, li deşta dîrokê diçêrin
bêrîkirinê..rojhilata xewnê dihêrin
şevên we, ava reş ji denê rokê vedixwin
stêrkên ne xuyayî
mirina çiran û oxiran,
perda hawarê li ser Silîva radixin
Lê lê Xecê!
Ne gelî ye
ne gilî ye
ne xwelî ye
ne jî sî ye
xwe dadidin şax û xêzên vê evînê
Lê lê Xecê!
Lê dayîka vê birînê
Siyamend e
ji elind e
xwe dipêçe li giyanê vê zemînê.

## ÇARÇIRA

### 1

Yazde mehan stûn li bin perwazan vegirtin
Yazde mehan karexezalan
dilên xwe di rûyê rokê de nedigirtin
Mahabad û xuşkên xwe ji kêfxweşiyê digiriyan
Kulîlkên azadiyê, bi bayê berbangê re difiriyan
Lê belê hatin!!?
Hatin vebişirandina çarçira
ya zelal û dilovan
hatin xilmaşbûna qurnefîlan
li ser dêmên nîştiman

* * *

Û êvarek perşkestî bi dû de dihat
seyrangeha leşkerên oldar e
celladên Ey Reqîba Dildar e
Dilbijokên guharên te ne
Bi'okên avî û darên te ne
û hat.

Nesrîn di destê xwe de kirin berbat
û Qazî tu mayî
Hevîrtirşê rojhilat...
Tu keskekî tarî û dilsoj bûyî
bîranîna her cejin û roj bûyî
serpêhatiyên me
gernameya başokan
kurtepirsa cangîran kurteçîrokên bapîran
erê, erê
tu çîrokvanekî bêwestan î,
zeyzefûn û biya bî,
zeytûn û kinêrên cêwî
guhên xwe miç dikirin,
di tovên tirsê de wêneyên te
hiltînin..
hişê zistanê bi heyvanê Çarçira
dimeyînin..
darikên sîwakê û lerza sêdarê
bi hev re ditepînin.

## 2

Wê gavê
em zarokên te bûn.
Keyqubad em bi nav kirine
Zeredeşt mîna qizwanan
mîna toza sim û karwanan
em belav kirine
paytextên spî, bêxweşî
hezar sînorî bi me veda
trên û gemî li me siwar bûn
şev û tenhatî di kenê me de rabûn
û..

Hê xwîna te di hêlîna çarçira de
zuha nebûbû
ji nû ve hatin
çi bi lez in ku tên Qazî?
Hê buhara Västerås (1)
negihiştibû şebnemê bilorîne
gerdûnê ji bîr kiribû
ku çerxa mirina me rawestîne
hatin desmala te ya hevrêşimî
ya ku me li dor êşa dilê xwe girêdabû.
Gur in...gur in gur
hatin
desmal û dil bi hev re birin.

(1) Navê bajarekî Swêdê ye ku qîxa Qazî Mihemed, Iffet Qazî lê hate kuştin.

## 3

Wê gavê
bi lepên nalînê cergê çiyan badan
bi dû çil û pênc mûman de
lehiya êgir bi girî dadan.

## 4

Û hê jî em zarokên te ne Qazî
Te bernadin ji jîna xwe
bi te dijîn evîna xwe.

*Eger tu li Çarçira*
*bê rêber, bi çevger*
*û matmayî mayî,*
*Eger tu ji tirsê tî bûyî*
*û tu ketî gergerînoka*
*belkoya esmanê sahî,*
*Eger te dilê xwe danî*
*ser destê xwe*
*û te kir qîrîn*
*li çiraxa wî Xwedayî,*
*Eger te tembiyên xwe*
*yên zelûl û sar kirin dar,*
*Eger te hirmiyên xwe*
*yên tirsok û jar, kirin mar,*
*Eger tu hingivî Mahabad*
*Tu bûyî xembar,*
*Eger tu ji çarçiran dûr ketî*
*tu di nav baxên bîranînê de*
*raketî*
*tu bûyî sermest û evîndar.*

12.09.1990-19.01.1991

# Newroz û serbitackirina qublenameya giyan!

## 1- Xwelibakirina Agir

Xwelibakirina te, kurrîna wêneyên bişaftî di tava heyvê de û biskên te stiran in, qaçax in, şewatên navdar di herikîna xewnên te de, lêvên te yên birewa di çirisandina kenê hîman de, di serpêhati û sawa guran de, kulîlkan bi xunava agirînî dinuxumîne, bi ser bêdengiya çarmedor de hechecîk û mizgênxêran dibarîne.

Te ewrên mişt hêsir dikişkişandin zeviyên çavlirêmana sermest, fîxana te gul vedidan û roka Sîpanê xwe bi awirên agirperestan dipêça, dûmana te dipêliya û hesreta dayikên reşgirêdayî, xewna bapîr û şehîdan bi xwe re winda dikir...

Me xweliya te bi hemû hişên xwînê ezber kir. Me jîndariya te bi çeperên matmayî parast. Me sûlavên xwe di naveroka rengê te de, di çepkên dîroka te de hilanîn û li ser spehîbûna sirûda oxirê, me cendek û buharên serberdayî raxistin. Me destên xwe davêt guliyên te yên zêrînî, me dilê xwe davêt nav guregura hewldana te û evîna çiyan xetîreyek bêrawestan bû...

Te xwe li ba kir û şeva me bi xwekuştina pinpinîkên xatirxwestinê dihat xemilandin. Li ser zîzbûna ebrûyên te, li nik xwelibakirina stêrkên nûrijyayî, kerwanan bargeh û konên reş vedigirtin.

Ji bêçarî dihingivîn bejna binefş û lalan û li toza ahengên kevnare rast dihatin, serûkaşî rûbarên MEZOPOTAMYAyê dibûn û diweşiyan. Mîna pelên payîzê ji dara xewnê diweşiyan. şîniya wan heft ber bû, û ji agirê şeva pîrozwer hesinkarekî rûbedew berbanga niştîman ya dijwar û çetin, bi giyanê xwe re, banga wêranker û boş dipijiqand!

Ey agirên vê êvara kavilbûyî!!
Ey rojçêbûna şewata xunc û şaxan!!
Giyanpijnooo!!

Sersal e û lûtkên çiya yên payedar û xoşewîst, yên ku serê xwe danîne ser zendê ZENDAVISTA, yên ku bi qebqeba kewên kovandar û pirdax hatine lorandin, hêdî-hêdî xwe û bîranînên xwe dispêrin agirgeha rokê.. Hêdî-hêdî çirên bendîxanan vêdikevin û sîbera KAWA ji pencereya şeva zikreş diherike, perdeyeke agirînî li tazîbûna berfê dike. Rojeke nû tê, li tenişt berû û şengebîyan rûdinê. Agirekî newrozî ye û bi hilperikîna sînoran gurtir dibe.

Ferhenga bendemanê bi sema û tîna govendên rengo-rengo diqiçqiçin. Ezmanê stemkar û nijadperestan ji nû ve xweliya êvaran werdigerîne zimanê kuştin û serjêkirina fenerên azadî û mehrevaniyê. Xwelibakirina te şox e û di çavên te de tovên lîlandineke bêhempa amade ye.
Li ser eniya te ey agirê dûrketî ji kezeba min, wê navên me yên şikestî û rengtarî geşbûna xwe bidomînin.

## 2- Şahnaziya Avê

Di neynikên te yî şelû de, tuxmên hewara xwe vedişartin. Nijdeyên hespan di toz û rewrewka rêçên te de, û girî û rimbazên bînçikyayî berbendan hişyarî dilovaniyê dikin. Şahnaziya te bi me dadibû, em tîtir dibûn û bi salan tov û terkên xewnê tî diman. Tîna kezeba me bi lawik, xoşxwan û dîlokan nedişkest, lê di herikîna sirûda te de, di bîntengiya elfabeya te yî dilkêş de, di xaçerêkên xuşexuşa te yî rewan de biyabaneke zelal û keşxe dibişkivî.

Me nimêja xwe ya dawîn, nimêja herî dirêj di hişê lavlav û hîroyê de, li bin siya baskên FERAT kuta kiribû, em berzûrî jena dilê te dibûn, berzûrî esmanekî dergehgirtî û zeyzefûnên tirsyayî di lêvên te de dibûn. Me xwe davêt pêxêra Tembûra te, zû bi zû te bi tiliyên xwe yî hinekirî giyanê me mist dida û kenarên birêveçûna te bi derdkêşana me yî bejindar şîn dihatin. Di xelmaşbûna çavên me de nexşeyeke bi simbilên bê baran, gulwazeke bengîn diteqiya. Keskesoreke rengtûj xwe berdida hedana lerza te û di gerdena te yî zîvîn de xwe diparast ji desthilatdarên ken û kêfxweşiya şevbuhêrkên te, xwe çem dikir hêlîna singa te, xwîna te dikeliya û canê te disincirî û qolinca te yî ku ji ber termê Helebçeyê mabû, ji xwe re, ji taya çiyan re, ji şebnema destê sibê re û ji çûkên malwêran yên bêrîkirinê re kiribû balgeha sermedî ya ji maç û rengên qedexekirî yên ala avê...

Ey avên vê êvara bextreş!!
Ey sorgulên vê Adara dilşikestî û radest!!
De kelekên şîniyê rawestînin.
De bedewiya avê bilivînin.
De rêberên nenas di neynikên reştariyê de, bi qurtên ronahiya hêjayî, hînî melevaniya bêdengîya sînoran bikin!

De di sersala bîranînên malkambax de, peşkên azadiya şepal bihingivînin mijankên Xabûr û stêrkên bizdayî dawerivînin ji spîndarên bendemana bêol!..
Av e û bi aviya goristanên belavkirî di ser dev re çûye...
Av e û cokên poşmaniyê dizivirin himbêza umîdên serjêkirî...
Av e û pêl bi pêl xwe dighîne reva niştiman û li ser kurtepista vê xewnê lehiya eşqê diponije, û gîhayê jibîrkirinê zarokekî avînî û girnijîna hetavê dizê.

## 3- Bûyer û Rûpelên Axê

Maka te ya ji hevokên cengê, ya ji veciniqîna talan û êrîşan, ya ku di gulîstana vê sosretê de guline birîndar û jibîrbûyî diafirîne. Maka te û zingezinga hêz û betalyonan di bejna te de, bejna te ya ku me bi gulwazên rengînî hûnandibû. Ma kê em hînî stuxwariyê kirine, ma kê em ji himbêza te ya dilovan û berfireh revandine?

Hê eşqa me pîtanokên te yên kehrebanî bi şîr venekiribûn, hê tu di pêçeka şevên havînê de bûyî, tu di dergûşa bîranînên pîrik û dayikên xemgîn de bûyî, ''bi guhdaneke nazenîn û bê vaj'' tu bi hetava destê sibê re dikeniyayî, te çandina mêweyên hebûna xwe di werzên Rojhilat de kuta dikir, em jî bi bîhok û hirmiyên te, bi xwîna maka te ya berfînî, bi rivîna gerdenîka te yî dilrevînî nehatibûn kedîkirin.

Me dilê xwe ji şûnşopa axa te guvaşt, me canê xwe li ber gavên te vedida, lê hemû koremar û tûpişkên di bin çermê te de, bi dilşadî, bi rojçêbûn û rojmirina me vedidan...

Me xwe newqî şîlan û sosinên te dikir, me bi hayedarî deşt, zozan û daristanên te mist didan, me karexezalên te, pezkûvî û keroşkên te parastin ji çavnebarbûna biyaniyan, û tu di kulîlka emrê xwe de bûyî ey xaka ku ji ber sim, dahol û leşkerên tolaz mayî!!.

Em.. Neviyên te yên bê nav û paşnav. Tuxmên ku di zikê MÎDYA de hatin avdan û perwerdekirin, pîkoliyê, dîlîtiyê, xwînmijiyê em dan ber pêlên xwe û mîna qirşikên li ber bayê, em li ber vîzevîza axîna te serûbinî hev dibûn û mîna qeyikan, em di lehiya gazî û hewarên te de çûn destê mirina bê bav û dê û careke din em li dilovaniya te poşman dibûn!

Ey axa taristana kurdnas!
Ey balindeyên Newrozistana ku nayê bilêvkirin, ey çûkên sergerdan! Ey goristanên ku di pencên axê de çavvekirî xew kirine!!
Werin! Ax e û bîna xwêdana bapîran ji awazên çiryayî difûre..
Kildankên bajar û gundan hildiperikin mijankên westiyayî, giriyayî û ji bazinên zemîna diltenik bêparmayî... Werin!!

Li ser bergên sotî yên vê êvara dadayî, hevdîtin ditewire, û ji qirika vê bahozê dengê bilûra zelal û hêmin diherike. Çar qulingên perşîrkî, bi hev re li esmanekî nûhilatî temaşe dikin. Û bi dilsojiya stirana axê xwe dadidin asoya firînê...

Bi cejna arînî me serdemên te bidarvedikin û maçîkirina hinarkên te mebesta pêdariya me bû. Jiyana me bi çemên te dest pê dikir û hebûna te jî bi mirina me herikandina xwe berdewam dikir.

Bi tîrêjên maka te di lalbûna şevê de, me dida dû sîbera rûmetê, û herdem desmalên şîniya te, çerxên berbadbûyî yên ronahiya te di guldankên tenhatiyê de şîn dihatin û bi rondikên gunehkariya bêpayan hişîn dibûn, ey axa ku por sipî kiriye ji bûyeran.

**Buhara 1992**

# 2
# Awazên Rono
Bo Nûra Şêx Bekir

Destê xwe deyne ser eniya min
Mîna ku destê te destê min be
Min himbêz bike
Mîna ku tême kuştin
Jiyana te wisa bû
Ji min hez bik!!
Mîna ku wisa çaktir be
Mîna ku dilê min, dilê te bû..

Îtîl Yojîf

Şêx gote wê bêşik we bû
Navê bixwe qelbê me bû
Ew eserê miska te bû
Lew zahirî behn ji min tê..
Miska te ez rengzer kirim
Hubba te ez ebter kirim
Pêçam di dêrê wer kirim
Îname ser vê haletê

Feqeyê Teyran



RONO 1

Hêlîna me ya ji tevna bendemanê
çûka nalînê di pencên demê de!
Porê te yê berdayî li ber bayê kovanê
Raperîna şevê di bêhişiya gemê de!

RONO 2

Pênc demsalên kerikî
Di hêsrên te de dinivin...
Pênc oqyanûsên zerikî
Di xwîna te de dilivin...
Buhareke qehweyî ye
Lêvên te dişo ji stêrkên tirsê...
Buhareke kesk î tarî ye.
Çîçekên gerdena te dike pîşo
Û guh nade pirsê
Û buhara te tê
Ji leylan û xweliyê
Ji kuncî û tûtina qaçax
Ji pîvazterkên Xursê
Buhara te mîna ziya
xwe dadida girnijîna Xwedan
Ji bêrîkirinê şiyar dike
Termê helbestan
Serpêhatiyên te dixwîne
Demsala te bi te
Û bi şîrava xewnan dimîne!!

RONO 3

Gula berbero
Ya ku her ro
Bi pêjna te dilşad dibû
Dilîland
Û çiya bi xwe re dihejand
Ya ku zerekî sosinî
Bi ser hinarkên roavahiyê de
Dirijand
Ew gul ..,
Bû kul..,
Ji hesreta hevdîna te
Pêsîrên mirinê mijand!

## RONO 4

Odeya me
ku di bayê wê de
welat
û çavên bendemanê
xwê dabûn..
Kenê te
ku bi dizî
êşa serê Xabûr
nalenala nerm î hûr
tê dabûn..
Zengilê dergeh
ku xwe spartibû
pencên tirsê
û giran-tava dilê te
ku ji esmanê sînga min
bariya
û giriya
/wê havînê/
bi seqema pirsê..

# Ronahî



## 1

Bendewarekî dilsoj im
Di xumexuma navê te de
Bê kelek û roj im
Bendeee-ariya demê me
Di gavên te de, qudûmekî şkestî me!
Di bêdengiya lîwanê de,
tuê bizanibî ronahiyê
Ez kî me!
Qulingekî nijadşewat im...
raperîna awirên lat im...
asoya perengî me,
ji rengên şevê... berbat im,
di daristanên kenê te de,
bêyî mistek sî me!
Di xaçerêkên birîna te de,
bi guliyên berfê
bi rewrewk û qerfê
tol ristî me!

Û bendeee-arê te me
koçerekî kul-pak im
/ dikim û nakim/
hîva çavê te, ji girî cuda nakim...
- kevirekî bêdîrok im
di biyabanên te de bêkok im
- di lîstgehên sînga te de, zarok im
/ dikin û nakin / peyvên te ji fîxanê ranakin...
û bendemanê dûzan dikim di xwe de.
êzing im...
rêving im..
qermîçekên hinarkên tûyê me
pirîskên giyan... ji hêtûna gulê me
va...xewnên xwe yên mişt baran
        ji sînorên te re dikim zîndan
va... dihungivim şopa te
va... dilbijandina xwe ji gerdena te
                berdidim,
        va tuê bibarî ?!!
        Tuê bi xunavê şa kî
        Simbilên helbestan
Va... tuê bizanibî ku tuxm û xwezî me!

## 2

Bendeee-darên te me
Gava ku pêlên kesk
di kelkela qonaxê de winda dibûn,
hespekî fal î çê bûm...
rêberê oxira mijê bûm...
min serî ji bayê kur distend,
min reşgirêdana te di hişê xwe de
kiribû merbend,
xuşexuşa sûlavan di porê te de
hatibû birîn, ewrên çiya ên bê rewa,
teyrên şev li wan geriyayî,
cenawerên çavgirikî
        serjêkirin beloq dikirin...
kulîlkên warwêranan... nameyên evîndaran
co... û keserên no, newq dikirin
zaroktiya ku bi tolkê re
                reviyabû/
ya ku di terkên havîna te de
                riziyabû/
ya ku em hiştin di zengilê tozê de,
va ye... ji nû ve di dorava bendemanê de
                xuya bû/

## 3

Û bendewarê te bûm.
Navnîşan û qelaş bûm,
bager bûm di banga lehiyê de...
perîşan û xaç bûm,
derbeder bûm di ferhenga tenhatiyê de...
karwanekî ji mewîjan derbas bû
Sîpanê Xelatê di destên elinda te de
                    bi bizav bû.
şkeftên aramê di qolinca te de,
- Nalenala nazenîn î.
- çavxumariya nijadperest,
- Mûmên veşartî di pênûsa GORAN de,
- Rêçên vemirî di sêdara PÎRAN de,
Wergerîneeee!!
Zimanê bendewariya giran.

## 4

Û bendewarê te me!
Gername bi te, bi reşbelekên evînê
û hespê min jî bi te ketiye..
tiriyê westanê me,
huçikên te bernadim
ku esman çardeşevî be:
di bergeha Ferat de bi dizî dibişire...
di movikên rojhilat de bîranîn diqeşire
ku esmanê talanê ji binî de bêşevî be:
di tava dilê min de biskan dihûne,
çavsor şor dibin,
lehengekî ji gwîzê me...
simaq im...
wawîkê xatir xwestinê me
qijalk bînteng dibin, lê lê dînê!!
êvarên cûmik di hevdîna maçê de dereng dibin
lê lê dînê!!

Û her tiştî bi gunehkariyê dirêjim,
û ji keç-dîna xwe re dibêjim:
bendewaaa-barê te me
xêzên cot im... di zemîna te de/
gur û sot im... di birîna te de/
çortan im, tama şor im di bin hesîra te de/
volkan im, kor im, di desthilata pêsîra te de/
kîn im, çavkaniya şîna comerd im... zelal im
bo danheva morîkên rokê, şox û delal im
bo lorandina şagirtên cengê dergûşa gurzê ZAL im
pencereyên barana te me
dûrî te me... porkura min!!
Dûrî xwe me!!
Ser bi te û bi tem im!
Pirekê ji xewnên agirperestan
di navbera memikên te û lêvên xwe de
ava dikim/
şerbeta hirmiyan bi te da dikim,
hêlana te,

rêl û pesaran ji himbêzkirinê
                    radikim/
peşkên sedefî ji dîmenên zistana te
                    derdikim/
- Hec...hecîk
- Hec...legleg
- Hec...kêzik û kewekî ribad bi te
                    dadikim/
serpêhatiyeke dilrevînî ji gumeguma giryanê
kenekî bi çavşînk,
pêlava ziyanê
        bi şima serdemên te çêdikim/
dil dikim çengil ji boyî jîna te,
spîndarên porê te têne xwar
diweşim ji derza te,
hildikişim lerza te,
dim...riiim
neynûka te me,
derbesta bendewariya xwe dikolim.

## 5

Şehîd û rûbar in
bi pêjna dildaran/ dikelin
çar welat in, bi lale û xelat in
ji lîrên eniya Zîn dikevin
û... sindoqa bûkaniya te vedikim...
şal û şapê riziyayî,
Belex û Zeredeştê sêwî mayî li xwe dikim...
û bendemanê, ziryanê,
serçavka lîlanê li te dikim...
-Sînga min çeper e
beranê evîna te me
keriyê nêrîna te me/
di taristanên te de dibiriqim
di buharên koça te de dixeniqim...

Xox û berberoj çiriyan/
qizwan ji stêrkên rijyayî reviyan/
xeftanên qesebî di nava min de giriyan/
û min gazî te dikir/
tîrk û kevanên ronahiyê, min
nîşanî dilê te dikir!
Te guh neda dabeşkirina min,
reşkê şevê di kezeba min de rabû...
viyana min rijiya
şeva min şkest û bi te da bû...
xirxalên te di gûzekên rê de asê man,
navê te bi devê min ket,
û bendewariya te,
bi qîrîn...di bîbikên welatekî xewrevîn de raket.

# Tilî

## 1

Vemirî ne..!
Di dumana bêagir de dirikrikin, di kenê bêdeng
û kelê de, li hev dipirsin..
Bizav nîşana demê ye, lê seranserî giyan
dorpêç dibe...
Bi naveroka xewnê, heyîn rist,
bêqudûm pelû dibû dîwarê bêdengiyê.
Li beramberî vê lehiya kor û yûz, vê bahoza şît
û kawik, kî dikare nifirên bêcir û kevizgirtî,
Daqurtîne..??
Tiliyên ku bi kesera dîrokê hinekirî, dilerizîn.
Tiliyên ku êdî hew dikarin hêsirên peyrûzî
Rawestînin.
- Evîndar bi girî, bi kûrekûrê bîna xwe vedikin
- Eger rondikên dil û cerg, çemên hinarkên wê,
bêtin zuha kirin, eger kelem û singoya zingarî
ji bîbikên wê bêtin hilkirin..
Pêwîst e tilî jîndar bin...
Pêwîst e tilî livdar bin...

## 2

Deh tilî tên serdana hişê wî. Bi sed awayî hişê çilmisî tê guvaştin.. Wê çawan fêrî hijmartina tîliyan bibe..?
Di nav reşeke tarî de digevize. Bêkenar û kenêr e, bêsî û stêr e, bêşar û şilêr e. Di aşê evînê de tê hêran. Xwe dispêre şaxên piyê wê, xweştama lêvên Wê, dûkela seqema singa wê.. ji rengên çavên wê, Elfebaya xwe didize. Gula berberoyê li newqa xwezaya Xwe dialîne, berê xwe, her derê xwe dide guhên wê :
- Du tilî nîşana serfiraziyê ne.. an xaçeke zêrîn in
- Bi sê, çar tiliyan mirov dikare zikê yara xwe ji Ken biçirîne.
- Û... û bi tiliyekê, bi şûjinekê, bi serê pênûsekê, Bajarekî ji berfê, ji kevokên spehî, bajarekî Xewnperest têt qir kirin, di bin perda jehrê de têt Veşartin...
Bi tiliyekê mirovek 'kî be bila bibe' tê kuştin...
çavek 'çi reng be bila bibe' tê rijandin...
Pirsek 'ji kê be bila bibe' têt kirin...
Û bi tiliyekê jî, evîndarekî dîn dikare dilbera xwe şanî biçûk û mezinên bajêr bide..dikare, bi xwînê navê welatê xwe, li ser dergehên qalind, b i ç i r i s î n e.?

## 3

Hê jî vemirî ne..!
Vinevina zimanê wî ye. Guhên wê balgeha tiliyên wî ne:
- Mirovên cengperest yên ku her dem tifingên xwe nîşanî defa sînga berbangê dikin, yên ku di hêlînên kew û qulingan de hêkên çavsorî û zikreşiyê datînin, yên ku her roj simbilên ciwaniyê bi girî vedikin..
- Bi tiliyên xwe yên mezin têne nas kirin.

Û ... mirovên Binefş-şîlanperest, yên ku gurz bi gurz çîçek û sorgulan didin ber pozê jiyanê. Yên ku kelehên evînê ji nimebaran û buharê ava dikin. Yên ku di kelekela rêçên dûr de dihelin. Yên ku rokên rengîn di jene dilên xwe de, di sûravka çavên xwe de veşartine.. -Ew jî bi tiliyên xwe yî mezin têna nas kirin.. Du tiliyên beranekê weke hev nînin.

## 4

Hêdî hêdî, dem û cihan ji nav terkên tiliyên wî, direvin. Û.. ji nişkê ve, bi ser xencera hişê xwe de dişemite. Kê ev lehiya şêt û deyûz afirandiye?
Di wê neqeba tenik û teng de, di wê bizava tûj û dirêj de, toza zaroktiyê qermîçekên mejiyê wî mist dida û çermê dilê wî dinuxumand..
''şeştilî'' xwe çem dikir ser doşeka bîranînê:
Ho..hoo Şetiliyo!!
Tu serokekî nenas bûyî.. Bi tenê palan, perîşanan û parsekan ji te re digotin:
Tu jîrkê vê serdema qehpe yî..
De were lo! Çend tirên genim, ceh û pembo di ser şiva pişta te re
derbas bûne..? Çend çemên xwêdan û axînan ji moxila laşê te herikîn..? Çend zordest û xwînmijan piyalên meya xwe pê şûştin..?
Ma rast e şeştiliyo,
xelkên vî bajarî li hev digerînin û dibêjin : Xurtî û şiyana şeştilî di tiliya şeşan de ye..?
Zarok bû, kolan bi kolan, firoşgeh bi firoşgeh li şeştilî digeriya, lê kerr û gêj dibû, carcaran li hev rast dihatin, ziq li destên şeştilî dinêrî, kela dilê wî hênik nedibû, çavên wî bi dû tiliya şeştilî ya şeşan de, baz didan, pê re diçûn.. diçûn d i ç û n.

## 5

Vemirî ne!!
Diponije.. bîranîn ji serê tiliyan dinuqutin.
Zengil di xwînê de ye, dengê dilopan ji ber kiriye.
- Dayîka ku bîna wê ji dara hinarê difûre..
- Sindoqa bûkaniyê mişt benî û bastîq e..
- çirika bîrê, ava şêlû, qurta yekemîn..
- Mirîşka ku dida dû pişta wê, hêka ku bi lez xwe digihand tiliyên bendemanê..
Û dawî...welatê ku xwe jê vedizî
yara ku ji maçên wê têr nebû.

## 6

Rûpelên çavan li ber bayê tiliyan têne hejandin..
-ANKÎDO! Bo çi tiliyên te jî bi jana jiyanê nehatin bişaftin..??
- SOKRATO! Bo çi tiliyên te, bi jehrê tîna xwe şkandin??
- ZEREDEŞTO! Eger esmanê Belexê hê bi qralk û başokan
nehatibe cot kirin, eger dil bê cejn û govend be, eger lêvên wê, serê memikên wê yên pembik û step di nav serê tiliyên vemirî de neyên mist dan??
Helbet...dê çav ziq li çav binêre, dê dil ziq li dil binêre, dê tilî ziq li êgir binêrin...dê liv û dîrok ji neynûkan dest bi hilatê bikin!!

# 7

Di navbera çavên wî û matmayîna wê de asoyek ji xweliyê dihat ristin. Di wê kêlîka keriki de, cihan bi kurtayî dixuya. Qeraxên wê cihanê bi oxireke şkestî xwe li ba dikirin..dengê wî -şermok û şaytok- di nav xirecira hêsrên wê de, winda dibû. Peyvên wî bêtam ji serê tilîkan dipengizîn. Di asoya nû de, di perestgeha evînê de nimêj dikirin, xwe bi rondikan şad dikirin.

''Pêwîst e evîna xwe ji bayê reş, ji pencên sedsaliya bîstan biparêze.''

- Bawer ke.. ezê bi vî destî, bi van her çar tiliyan, jîndariyê li dar xînim.. tu carî ez dê li hember lerzê, na..na, ez dê li hemberî vemirandinê radest nebim..

Werzên tirsê di dil de.

Di zimanê wê de, stêrkên birîndar li bin guhê hev diketin..

kurtepist di lêvên wê de nivist..

- Tilî çar bin, an koremar bin, ji boyî evîna min û te ne asteng û serêş e..

lê ..neynûkek dikare dilekî -di kêlîkekê de- rawestîne.

## 8

Hin bi hin tiliyan ronahî dimiştin. Neynûk geştir bûn. Lerzê serê xwe xwar kir, çav li revê bû.
Hin bi hin tora dilê wê ew bi ser hev de dialand.
Tiliyan radipelîne.
Bilalûkên azadiyê di sînorê her çar tiliyan de, bê armanc in. Kêferatê dike, dilikume, dikeve, digindire, radibe û bi rabûne xwe re bejna êşê dipîve.
Li ser zil û qamira sînoran, axîma xwe yî bêhempa belav dike.. Dide dû sîber û pişta xewnê...

Çû... Çû... Çû... Çû...

Li malzaroka xwe dipirsî, li şûnşopa zaroktiyê digeriya.. Gava nêzîkî dara hinarê bû, serê xwe danî ser bîna dayîka xwe.. lê dengê Melê ew rakir ser tapanan:
Ehlê xêrê.. şeştilî 'emir da we.. Laşê wî li Camiya Mezin e, ê ku bê bi xêra xwe li ser nimêj ke, wê Xwedê xêra wî binivîse..!!
Zû bi zû rondikan xaçerêkên xwe di kezeba wî de nas kirin...
Zû bi zû agahdarî xwe bû, ku tiliyên xwe di nav hêlîna porê wê de ji bîr kirine.

# 3
# Nav û dabeşkirina xewnên hîroyê

Lêbelê em di havînê de bi rê ketin
Kirasên jinan pir di şînahiyê de diçirisîn.
Em jî, ji mêj ve li hespên xwe suwar bûne
Bêguman dê payîz be. Bi kêmasî li wira jinin xemgîn
hen in ku navên me dinasin

Rilke

Tu çûyî, te ez hiştim
li ber sî û sitara kevir hiştim
Germa havînê dijwar bû
kevir heliya
û ez di halê xwe de birîştim.

(Ji folklora kurdî)



## DAYÎK

Di esra teng de
di esra bêreng de û
di benefşa demê de
giyan xwe spartibû
dara hinarê
li ser serê te hechecîkên
serdema giryanê
- Kurê min!
Rewrewka dîrokê em xapandin
Axx dayê!!
De bi tayê xwe ê şima kirî
kefenê roka ber êvarê bidirû!
-Pîrka we pir ji we hez dikir
Bastîq û benî ji we re dianî
Li gundikê Sem'o mast ji we re dimeyand
Karwanên evînê, toza birînê
Bi gavên xwe re dikişand.

-Serxet û Binxet nebû
Lê belê xalê we di qiçîna Tebaxê de bi mayinan hatibû kuştin.
Di esra teng de
dara hinarê digrî
Hechecîk dişkin
Serdem dibawişkin
û bîranînên te
li hawîrdorî zaroktiyê rûdiniştin.

SEÎD RÊZANÎ

Wê êvara ji guliyên Zêwe
te stirana girî di dilê min de
lorand..
Di xumexuma wê taristanê de
te dengê şîniyê
ji bin zimanê çiyan
civand..
Em bûn gurzek stirî
me sînorê bobelatê birî
û ..,
şiva hesinî saza te
ji velerizîna destê rokê
kirî
û.., berya ku di sibehên biyaniyê de
li ser pişta nalîna Amûdê
siwar bim
evînê ez kirim pêlek
bi mûsîqa te
xelkê dengê birîna min
nas kirin..
Serê min yê tevizî
li ser balgeha stiraneke te
rast kirin..

1990

AMÛDÊ

Her sibe
me gulên te yên zikmakî
me rêçên evînê û dilpakî
bi xunava bêrîkirinê diparast,
dergehên bi navnîşanên şînê
di axîna te de
peşkên barana sersar û dîn,
û me xewrevîn bi ebrûyên hêviya stewr dialast
em çûn xwê... dara tûyê di tozê de ma,
em di sînga te de ji girî lal bûn
lê tu mayî, zengil
û temaşevana dilrast.

MENAL

## Bo Menalê

Du sal çûn!
Di ser şiva bêrîkirina min re
derbas bûn.
Du sal çûn!
û berf di nava min de disincirî,
çiqasî dûr im ji wê hinarka kelegirî!?
Te pişta xwe dabû dîwêr
hêsrên te di çavên min de
bûn kêr
min hewil da ku xatir ji te bixwazim
lê wê nîvrojê
apê te ji kulan re
bûbû çêr
Menal!!
Menale!
Du sal çûn!
maka dilzariyê çirandin
ez û tu,
qonax û Gurê Manco ji dayik bûn
û birîna giyanê min
hê jî maye bê dirûn!

SÎPANO

**Ji bo M. Efîf**

Şev bû...
bajarekî bêdeng û dev bû
canê te bi girî re li hev bû
pencereyên bîranînan
bi bagera nermînî
di dilê te de vedibûn
lerza qonaxê di dilovaniya berfê de
digevizî.
Û çûkên destê sibê
ji çîveçîva pênûsê derdibûn.
Te dîwarê min yê hilweşiyayî
bi xwe re dilorand,
te baz dida,
te xwe dida
ber hilma welat,
te bi ewrên evînê
barana sirgûnê dicivand...
tu diterikî
tu hildiperikî
tu hildiperikî salên reviyayî
tu dibûyî qublename
û rivîna
stêrkek nûrijyayî!!!

Dê êvarek ji mijê
li me bipirse!!
Çavên berfê li ser devê riya te
qerimîn!!
Paytext û meyxane
şûnşopa kenê te ê koçerane
bi xwe dadikin
çûkên çiya ên şîrkî
sinbilên helbesta dilşkestî
bi nikulên Helebçeyê
ji xewna bêbinî radikin.
Nêzîk!!
Em ê di festîvala giryanê de bicivin
dê rexên te ji dara dilê min
biweşin!!
-Xwe ji sînga min bernede
Zîna baskokirî
bi tofana şîniyê nede
navê bajarê xwe,
derdê tirşokî
li ser dîwarê odeya min
raxîn!
Bavê Lorka
hêdî hêdî
ji reşka çavê Mizgîn
daxîn!
Nêzîk!!
Êvara ji tûtinê
dê ji me bitirse!!

FERAT

''Carekê''
- Eger tu hatî
û lehiyek,
bo min kir xelat
- Eger te ez daweşandim
ji toza
tirsê..
- Eger te ez meşandim
li ser pêla
pirsê..
- Eger te ez hiştim
di hêtûna
hawarê de..
- Eger te ez kuştim
di dumana
dildarê de..
- Eger te wêneyên kovanê
bi şebnemê
şil kirin..

- Eger te çar rexên cihanê
di birîna kewê min de
kil kirin..
- Eger te rengê xwe ji
keskesorekê
kirî..
- Eger te ''ronahî'' ya min
bi dizî
dî..
Tu bi Xwedê kî bêje:
Bo çi, ta kîjan jînê
tu ê hêsran birêjî..?
Bo çi ro li ser serê te
xav û gêj e...?

## GIRÊ ŞERMOLA

**Bo Seîdê Melle**

Li başûrî Torosekî kovandar
li rojhilatî hevêrtirşê giryanê
di navbera du goristanên zîrek de,
serê xwe dihejand,
çîrokên xwe dirijandin,
- li zaroktiya me temaşe dikir,
agirê Newrozê diarand,
- xweliya xwe bi ser neynika xewna me de dadikir!

## DÛRÎ

Biyanî av e
axîna te derya ye
kolana şerpeze
ez ê vê carê
xwe bavêjim sîtava te
mîna lehiya kor..
nehişî,
wek leşkerê bêgor..

PIRS

Zistan germ e
bîna mirinê ji
baranê dipijiqe
piştî kêlîkekê
dê tava pirsan raweste
taku dilê rastiyê bibiriqe!

## DÎLAN

Destên xwe dan ber baranê
çavek da Kulîlka Nîsanê
pirsa xwe
bi qebqebê av da
xewna xwe,
bi halanê re hilda
û berê xwe da
vebişirandina Şîlanê..
Dîlan bû pêlên gumanê
û Dîlan ma!!
Ma xweşmêrê Dîlanê!!

Bo Remzî (S. Rêving)

Di wê şeva spî de!
Ez û tu û berfa Stokholmê
bi hevdu re digiriyan.
Ew şev helbestek xemgîn û nemir e
lê mixabin ku ez ê tu carî nikaribim
wê binivîsim.

...
Rojhilat di xeftanê te de asê bûye !!
Rojava di çepkên te de çêbÛye!!
Bakur ketiye paş çeperên şevê!!
BaşÛr bÛye leheng Û hozanê revê!!
De rabe bo min bêje:
kîjan darê ji dilê xwe re bikme kerker
kîjan darbestê
ji govenda birçiyan re bikime per
kîjan çiyayî ji hejmartina qamçîyan re
bikme ferheng
kîjan zemînê ji sirÛda serxwebÛnê re
bikme pêşeng
kîjan helbestê ji naskirina hebÛnê re
bikme sînor
kîjan mebestê ji gewriya nebÛnê re
bikme tor ...?